Kesê ku çûye jibo mafê gelê Sûriyê bidest bixe û îro Serokê Şanda Opozisyonê ya Danûstendinan e li Cinêv, Es`ed Zu`bî, di hevpeyvînekê de ku hate ragehandin ev hevpeyvîn berî çend mehan bû, bi tundî êrîşê dibe ser Kurdan û wan bi xayin û nemirov bi nav dike, û gelek sixêfan jî derheqê wan de dike, herwiha sivkayî bi Pêşmergeyên Kurdsitanê û Şervanên Kurd dike û dibêje: "Kobanê bajarekî Erebî Sûrî ye. Artêşa Azad ew rizgar kir, lê Amerîka 10 Pêşmerge rê kirin jibo bêje ku Kurdan ew bajarê Erebî rizgar kir." Herwiha serkirdeyê rêjîma Sûriyê û Mamosteyê Opozisyona Şoreşa Sûriyê! Dibêje: "Rêjeya Kurdan li Sûriyê bi tenê ji %1,e "

Ji bilî gelek sixêfên ku mirov şerim dike li wan vegerîne û qîmet bide xwendevanên wan gotinan.

Rojane bi xêra torên komelayetî û ragihandinê rastiya zihnîyeta Opozisyona Sûriyê ku xwedê giravî bi navê miletê Sûriyê diaxivin zelal û eşkere dibe, bi giştî ew kurdan heta wek mirov jî nabînin, û zen dikin ku ew û tirk tenê xwedan welat û erd in.

Ev yek gelekî ji bo me Kurdan baş e, lewma divê em nas bikin aya hevalbendên me kî ne?

Heta niha diyar dibe ku beşekî mezin ji serkirde û rewşenbîrên Ereban nikarin têbighên ku heger di welatê Sûriyê de ew û Kurd hevbeşên vî welatî ne, heger em nikaribin pêkve bijîn, bila em dirawseyên baş bin, ew qasî me ne mirov dibînin bila xwe ji me dûr bixin.

Daxuyaniyên bi vî rengî ji mêj ve li ser zimanê serkirdeyên opozisyonê hatine der, ji Burhan Xelyûn bigre, heta Coric Sebra, 'Eta 'Eta û vê dawiyê Es'ed Zu'bî û tiştê nehatiye diyarkirin dê xirabtir be.

Li gorî min daxuyaniyên bi vî rengî ji kesên ku heta doh, darê zorê li dijî gelê Sûriyê ligel Rêjîma Esed di destê wan debû û xwîna milet dimijandin, vêja di şev û rojekê de heger hatibin nav refên opozisyonê ev nayê wateya ku wan nerîn û ramanên xwe guhertine, belkî hatine ku di riya opozisyonê tiştê di nav rêjîme de jidest dane careke din bi navê 'irûbet, Islam û mafê gelê Sûriyê xelkê bixapînin û berjewndiyên xwe biparêzin.

Ji aliyekî din ve zihniyeta bi vî rengî gereke zingilê metirsiyê li cem lêbide û em li xwe vegerin aya rewşa Kurdan li gorî guhertinên ku li Rojhilata Navîn dibin dogunce.?

Rewşa Kurdan ya ne liserhev û dabeşbûna wan bo ser çend hêlekî û nebûna yekhelwîstî derbarê mafên serekî yên Kurdan û şêwe û rengê bidestxistina wan mafan, dihêle ku nûnerên me di danûstendinan de bê hêz bin û dengê wan jibo mafê gelê Kurd û gelê Sûriyê winda be û bê qîmet bibe, lewma jibo ku em karibin rêgiriyê li vê pêla şofînî, nijad perist û kultêrxur li Sûriyê bigrin, berî her tiştî divê mala Kurdî were rêkxistin û helwêsta Kurdan jibo mafên serekî û rewa yên Kudan yek helwêst be.

Girîngtirîn xal ew e ku Kurd bi yek dengî xwe ji hemû şandên Opozisyon û Rêjîmê vekşînin û doza şandeke serbixwe û cuda ya Kurdî bikin, çimkî doza Kurdan û pirsgirêka wan li Sûriyê pirsgirêk û dozek neteweyî ye û cuda ye ji kêşeyên taifî û mezhebî li Sûriyê, herwiha Kurd li ser zemînê bi serkeftî şerê Têrorê dikin, beramberî vê serkeftinê Kurd hêjane ku şanda wan ya taybet hebe.

Duyemîn xal ku ew jî gelekî giring e û piştî yekbûna helwêsta siyasî tê, ew jî ew e ku bi hebûna vê pêla nijadperist û radîkal li dijî Kurd û pêkhateyên din yê Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê, girînge ku Hêzên Leşkerî yên Kurdî li Rojavayê Kurdistanê bibe yek, bi wateya ku leşkerekî Kurdî û Artêşek Niştimanî were avakirin îdyolocî û baweriya wê ew be, parastina berjewndiyê Gelê Kurdistanî bi hemû pêkhateyên xwe li Rojava Kurdistanê.

bi hebûna yek helwêstî û hêzek kurdî wê Gelê Sûriyê bi giştî piştevaniya me bike, wê demê wê karwanê me bi riya xwe ve here û "ewtewta" hin segan dê ti bandorê li karwanê mirovatî û mafperweriyê neke.

Ji xwe di vê derbarê de kaseytiyên wek Zu'bî ne tenê ji aliyê Kurdan nayên qebûlkirin, herwiha piraniya gelê Sûriyê jî wan qebûl nake, jiber diyar e bê kî bi mafê gelê Sûriyê re ye û kê şoreş û xelkên şoreşê firotiye û pere jî li mêvanxaneyên Stembolê xerc kirine.

Gotarên Weşandî Nerînên Xwediyê Xwe Ne

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Dadmendiya Veguhêz

Parêzer: Zahid Mehmûd

Komeleyên mirovan, di qonaxên hebûn û pêkveçûna xwe de, rastî gelek ezmûn, bûyer û serpêhatiyan bûne, loma hewldanên wan nerawestane da ku karibin şêweyên berdewamkirina jiyanê destnîşan bikin û tiştekî xuzayî ye, çaxa em dibînin ku hemî liv û tevgera mirovan dikeve bin bandora bawêziya dabînkirina hebûna wan li ser riwê gerdûnê, pêwîst e li vê derê em bibêjin ev civatên di hinek deman de aram û tebitî, lê di demin din de ne aram in, dikevin nava şêl û pêliyê de, bi hev dikevin netebitî ne ji ber sedemên cuda nemaze binpêkirina desthilatdaran ji nirx û rûmeta pêkhateyên civakê re, û ji ber vê yekê gelê wî welatê ku ev kirîz û arîşe tê de peyda dibin, li çareseriya xwe digere, destê xwe davêjê çendî alav û yasayên demkî, da karibe xwe birêve bibe. Ji van biryar û zagonan re (Dadmendiya Veguhêz) tê gotin, ev têgeh di hebûna xwe de ne temen dirêj e, di demên şerê navxweyî de tê bikaranîn û sûd jî jê hatiye wergirtin.

Ev şêweyê xwebirêxistinî di danasîna xwe de ji hêla pispor û saziyên navdewletî ve hatiye şîrovekirin, wekî nexşerêyekê da ku pêkhateyên welatekî xwedî kirîz û ji hevketî karibin şaştî û tawanên berê sivik bikin, mafê her kesî jî di wekhevî û dadmendiyê de parastî be.

Li dûv vê pêşgotin û danasînê, divê em çend xalên giring ragihênin, da ku em karibin armanc û xweseriya dadmendiya veguhestinê bi hev re parve bikin:

1- Ev pirensîpên, ku em di derheqê wan de dinivisînindemkî ne – ne heta dawî ne, ango em dikarin bêjin kulmek ji biryar û yasayan e, diktatoriyê bidawî têne û civakê jî ber bi reweşeke demokratî ve dibe.

2- Jiber ku ev qonax pir lawaz û nazik e-a veguhêz- û avakirina dema bê (paşeroj) li ser bingeheke asê damezrandî be, pêwîst e tevahiya reng û pêkhateyên civakê hevparê destnîşankirina nexşerêka vê qonaxê bin, da ku karibin bi hev re bijîn û xwedî yek maf û erkî bin.

3- Ji ber ku berjewendiyên tevahiya mirovên ku bi rewşa awarte hatine çewsandin, divabe bên bicîkirin, pêwîstî bi rêkeftineke civakiyî nû heye, lewra nivîsandina vê lihevkirinê li ser nerîn û vîna hemî beşên netewî û tîreyî ên gelê wî welatî giringiya xwe heye, da ku tu kîn û nerazîbûn veşartî nemînin, ango kesek dûrî vî karî nebe.

4- Heger em bixwazin dadmendiya veguhêz , bi jîwarî pêkbînin ji dil û can da ku tu goman li cem aliyekî, yan bihtir, nemîne; pêdiviya me wê bi lihevkirin û lêbûrîna civakî heye li ser tevahiya rûbera dewletê, ev kar – lihevkirin û lêbûrîn – di wateya xwe de asêgeheke çênabe bê jibîrkirin, ji ber ku tawanên mezin ji rex hin mirovan li dijî mirovin din çêbûne û divabû ev mijar neyê paşguhkirin.

5- Di vê qonaxa hestyar û tevlîhev de, avakirina dadgehên pisporî û dadwerên xwedî wicdan tiştekî bingehî ye û daxwazî bi veqetandina siyaset û desthilatdariya dadwerî heye, da ku tu biryar ji dadgehan dernekevin ji bo rengê mirovan yan jî ji ber regeza wan, yan ji bo nerînên wan yên siyasî, tîreyî û netewî.

Di dawî de, em dikarin bibêjin ta ku ew amancên dadmendiya veguhêz biserkevin, gelek hêz û pêdarî pêwîst e da rêzgirtin ji van yasa û biryarên demkî bêne girtin, loma çalakirina rêxistinên civakî yên sivîl û serastkirina karê wan erkekî nîştimanî ye, da bi alîkariya wan, em stemkariyê bişkînin û binyada dîmoqrasiyê deynin; û dîse di dawî de, em dibêjin ev gotara kurt hemî hûrguriyên mijara me di hundurê xwe de bi tevahî nade xuyanîkirin, bi tenê pênasîneke, ji ber ku mijar giring û ber fereh e.

Serdana Dibistanên Perwerdeya Bi Kurdî Li Amûdê

Helîm Yûsiv

(Xelek-4)

Girîngtirîn guhertina ku di van salên dawiyê de li Rojava bala min kişandibû, perwerdeya fermî ya zarokên kurdan bi zimanê kurdî bû. Ji ber vê yekê, min xwest ku biçim dibistaneke zarokan li Amûdê, vegerim heft saliya xwe û ne zimanekî biyanî, lê zimanê dayika xwe, bi zarokên hevtemenên xwe re fêr bibim. Ji bo pêkanîna vê xewnê, me berê xwe da cem birêvebera "dezgeha perwerdê" Yusra Derwîş ku ji bilî têkiliyên malbatî, ez wê ji dema xwendinê ya li Zanîngeha Helebê ve nasdikim. Cihê ku niha nivîsgeha wê û hevkarên wê ye bixwe jî berê bi navê Dibistana Xezalî ya Seretayî dihat naskirin. Li wir min û Ehmed Huseynî me şêwekar Welîd Elhuseynî jî dît ku li wir nû dest bi kar kiribû. Yusra tiştek ji wê tevger û germahiya xwe ya li hember hevalên xwe kêm nekiribû. tevgereke çûn û hatinê li der û dorê hebû. Behsa pirsgirêkên dibistan û mamosteyan, dibistanên bajêr û yên gundan û her wisa. Ji bo bi me re bê serdana dibistanan divabû neçe civîneke xwe ya girêdayî vî karî. Diyar bû gelek pirsgirêk pêdiviya wan bi çareseriyê hene û karekî mezin ji wan tê xwestin. Me xwest em herin du dibistanan yek jê ya perwerdeya zimanê kurdî, refa yekê heta sisêyê û dibistaneke din ku ji refa çarê heta şeşê, ku rêbaz û pirtûkên berê -yên dema rêjîmê- têne fêrkirin. Berê me kete dibistana "Ebdurrezaq Ibrahîm" û bi rê de gelek pirsên ku pêdiviya wan bi zelalkirinê hebûn di serê min de diçûn û dihatin. Ji dûr ve dîmen pir tevlihev xuya dikir. Perwerdeya bi kurdî ji bo her sê salên destpêkê destpêkiribû û ji nişkê ve hemû zarok û xwendekarên salên çar û pênc û şeşê mabûn bê mamoste. Bersiva rêjîmê li ser perwerdeya bi kurdî ev bû, ku hemû mamosteyên xwe ji dibistanan bikşîne û di bin gefxwarina ku meaşên wan nedin wan de, ew neçarî mana li malê kiribûn. Li hember vê çi hatibû kirin, min xwest ez bi çavên xwe bersivê bibînim. Bi derbasbûna me ya dibistanê re, li oda birêveberiyê vê yekê bala min kişand. Hemû mamosteyên zimanê kurdî jin bûn. Bersiva pirsa li ser tunebûna mêran bi qerfî hate dayîn:

- Mêr li vir nemane, yan li çeperan şer dikin, yan jî reviyane Ewropayê.

Bi ketina oda wanedanê de yekem tiştê ez çil salî bi paş ve vegerandim sopa mazotê û rûniştokên textikî bûn. Ew kêlîkên ku ez di nav zarokên heft salî de rûniştim û min bi wan re li waneya kurmancî guhdarî kir, kêlîkin gelekî hestiyar bûn. Min bi zorê hêsirên xwe vedişartin. Ey Xweda, ev çi li vî welatî qewimîbû. Ew çi ziman bû em bi zorê fêrî wî dikirin. Ew çi zarotî bû ku mîna kulmeke qirşik dabûn ber agirê koledariyê. Ew çi temen bû ku wilo di nav mij û dûmana bindestî, qehir û kerbên dijwar de tarûmar kirin. Ez di çavên zarokan de li wê çirûskê digeriyam, ew a ku bi her peyveke kurdî re şewq dida. Ez li wan çirûskan digeriyam ewên ku em hîn zarok bûn di çavên me de vemirandin û rihê me kor kirin. Mamosteyeke jêhatî bû li wê polê, zarokan bi kelecaneke germ destên xwe hildidan, dixwendin, dinîvisandin. Bi kurdî diqîriyan û bi kurdî dikeniyan. Zarokan, xweziyeke wiha bi min re çêkirin ku ez çil salî bi paş ve vegerim û ji nû ve her serê sibehê bêm dibistanê û her roj piştî nîvro vegerim malê, destê wê dayikê maç bikim, ewa ku ev zimanê şêrîn dabû min. Êdî ji bo xweziyan dem dereng bû. Zarok jî di polê de yan bêdeng bûn, yan jî bi dengekî bilind dersa xwe dixwendin. Ne mamosteya wan, lê Yusra li wan mikur hat:

- Wax, wax, yên ku nizanibe wê bêje zarokên Amûdê ew qasî bêdeng û biaqil in. Nizanin ku zarok wekî wan şûm tune ne.

Li min zîvirî û got:

- Ev ji bo we wilo bêdeng bûne ha.

Zarokan em bi roj baş û rêzgirtinê pêşwazî kirin, wisa jî bi rêzgirtin em birêkirin. Ji wir me berê xwe da dibistana Cegerxwîn û em li waneya zimanê îngilîzî ya şagirtên sala pêncan amade bûn. Li şûna mamosteya "rêjîmê" ku ew neçar hiştibûn li malê rûnê, mamosteya îngilîzî xwendekareke zanîngehê ya ziman û wêjeya îngilîzî ya sala diduyan bû. Bi zarokan re bi kurdî daxivî û şîroveyên xwe bi kurdiyeke ku gelek peyvên erebî di nav de bûn dikir. Dibe sedem ew be, da ku zarok baş têbigihîjin. Me xatirê xwe ji zarokan û ji mamosteyên wan xwest. Di wê navberê re mamoste Xelat Cizîrî ku birêveberiya dibistanê dikir, şêraniyeke wekî mêvandarî ji bo me pêşkêş kir. Bi dilekî xweş me mêvandarî ji destê wê girt û me berê xwe da peymangeha amadekirina mamosteyan. Navê wê "Peymangeha Zanistên Perwerdehiyê ya Şehîd Peyman Elî" bû. Li wir em di derbarê amadekariyên ji bo amadekirina mamosteyên dibistanan de hatin agahdarkirin, her wisa xebatên li ser amadekirina meteryalên fêrkirinê. Ji her pirtûkeke ku amadekiribûn min daneyek bi xwe re anî. Me li devê deriyê peymangehê xatir ji mamosteyan, wisa jî ji Yusra Derwîş xwest. Mizgînê Gemo li derve li benda me bû, da ku me bibe Qamişlo.

Di derbarê mijara perwerdeya kurdî de ez dixwazim du têbîniyên ku bala min kişandin vê xelekê bi dawî bikim:

1- Heta niha kelemê sereke di riya perwerdeya bi kurdî de rêjîma Sûriyê ye. Bi redkirina perwerdeya bi kurdî ji bo her sê salên destpêkê û bi kişandina mamosteyên salên çar û pênc û şeşê ji dibistanan, zirareke mezin gihande her tiştî.

2- Siyaseta şaş û qayîşkişandin û rik û kîna di navbera herdu aliyên siyasî yên kurdî de "Tevdem û Enks" bû sedema wê yekê ku malbatên bi ser Enks ve zarokên xwe neşînin perwerdeya bi kurdî. Bi behaneya ku dijî îdeolojîkirina rêbazên perwerdeyê ne. Bi her awayî di encamê de, ne dijî rêbazan, lê dijî perwerdeya kurdî bixwe derketin. Ev jî nîşana wê yekê ye ku heta niha li cem derdoreke berfireh ji miletê me partîtî di ser netewîbûnê re ye

Li Sûryê Yên Tira Dikin Dixeyidin

Hekîm Ehmed

Hema win çi navî li xwe bikin, dîse win ew in. Ewqas sal, win parêzvanên nirx û prensîpên netewa xwe û ola xwe û xak û dîrok û xaknîgariyê, we em bi jehrî xistin hingî we pesnê xwe û bav û kalê xwe da, win geh netewperest û geh oldperest û carina sosyalîst in, rojekê desthilat û rojekê rikber in, ê, me çi kiriye ji we? Çima em tim tawanbar in? Ya rast ew e, ku win nikarin bi welatekî aram û pêşketî biramin, we jiyan û berjewendiya xwe di zikreşî û kînên dîrokî de dîtiye, yan divê xewnên we yên gemarî bi cîh werin, win çend hezar sal vegerin, xwe bibînin serdestê cîhanê û gel hemû xulam û cêriyên bavê we bin, an win venahesin, ji xwe ev rêjîmên han, encama gemara mêjiyê we ne, incax win vegerin li dîrokê bigerin kê kî kuştiye û kî li gor şirî'etên êlên we mirov bûn, yên mayî ji mirovan jî tev pesnê we bidin ji ber we serên wan li ser milan hiştine.

Serokê Emrîka yê berê Abraham Linkolin digot: (Li dijminên xwe bibuhûrin, lê navê wan jibîr nekin), lê weleh em Kurd jibîr dikin, ê çima na, mane em birayê hev in, welatiyên hev in, doza me yeke dadmendî, azadî û rûmet e, lê em jibîr dikin ku dema ev kes dibêjin azadî, mebesta wan ku di pêlêkirina me de azad bin, wilo jî dema dibêjin wekhevî, ango em xwe jibîr bikin û di nav wan de bihelin ji bo reng û zimanê me wek hev bin, rûmet jî dema em tola wan ji dijminên wan hilînin. Belê, heqê wan jî heye, ma kengî Kurdan ji xwe re kirine, eger em di rewşa herî pêşketî de bin, em bi zimanê wan ê pîroz li zanîngehên bajarên wan ê mubarek li ser lehengiyên wan ê dîrokî dixwînin, wilo lehengên me ji ber di ber wan û dozên wan de ne, ne yên me ne, zanyarên me, ji ber di çarçewa çanda wan de ne, yên wan e.

Piştî ewqas sal ji zorê, ez fêm nakim, ev zikreşiya wan ji ku hatiye? Lawo, me dar dixwarin, tu yê duh pozê te şewitî, tu hatiye bawernameyan didî me? Tê ji nû ve me biraziyên xwe yên sêwî bibînî? Na, kes nema li benda we dimîne, ta win biryarê bidin ku ji mafê me ye em avê vexwin û nan bixwin li vî welatî yan na, ta win biramin bê gereke dayikên me li dergûşên xwe bi çi zimanî bilorînin, em we nas dikin, navê we di hişê me de kolayî ne û çiqas win rengê xwe biguherin û defeke xweş ji dûr ve lê bidin, bêhna we derdikeve.

Kolegeh nabin welat û bindest nabin welatî, nema durişmên xwe yên pîroa bi stuyê me ve bikin, herin li dilên xwe bipirsin û hişê xwe biparzinînin, tevî ez bi guman im, lê eger we dendikeke mirovatiyê di canên xwe de peyda kir, xwe ji nû ve çê bikin, eger çavên we yên kor em dîtin, êdî em dikarin wek bira hev hembêz bikin.

Lê tevî van wêneyên tarî, em ê li benda nifşên nû bin, ku zanibin gelek hebû birahez û aştîxwaz bû, ta asta ku pêl mafên xwe dikir, xwe dikire gopalê birayên xwe, lê birayên wî zenga hiş û dilê xwe di serê wî didan û digotin, ji xwe yê jor em in, digotin bav û kalên bijartî bûn, digotin win jî wilo xwedê win bêmaf dane, bêkes û sêwî, bê ziman û çand, digotin, tir dikirin û dixeyidîn.

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Di Riya Koçberiyê De (3-4)

Silêman Azer

Ew ristika ku ji nêzîka bîst û pênc kesan pêk tê, zarok, jin, ciwan, û çend kesên wek te nîv temenî, xwe di wê tayî re dikşînin û cihê xwe di nav wan darik, giya, stirî û kevzirê re dibînin.
Çima ev roj hate bîra te, qey li-hevtineke ku roja yazdehê miha Îlonê tu van dehil û daristanên Europayê bi qaçaxî derbas bikî, ew roja ku guhertinek mezin li cîhanê çêkir, û qey wê ev roj guhertineke mezin di jiyana te de jî çêbike, û wê te jî ji kokê ve hilweşîne, wek gelek pirsên ku bi tenê dimînin pirs, û bersiva wan bi demûşa van daran ve dilikin û di serê te de jî dilûsin ta demekê hişk bibin û ji bîranînê biweşin.
Erê roja rûdana vê bûyerê tu li bajarokê Tirbespiyê bû, û wek her car te karê belavkrina kel û pelên xwarinê dikir, û di televizyonan de zindî heriftina Navenda Bazarganiya Cîhanî wek kavilan li ber erdhejînekê hildiweşiyan dihatin weşandin, û mirov bi carekê matmayî dikirin. Dîsa pirsek bû çima û ji bo çi? Lê ma pirsek, û belkî ji sedema wê bûyerê tu îro ser riya koçberiyê yî?.
Gelo çawa wan kesan dikarîbûn wilo bi hesanî wan firokeyan birevînin, û bi wan wê bobelatê bikin, û çend hezar kes di wê kêlîkekê de jiyana xwe ji dest dan, gelo dewletek wek U.S.A nikarîbû rê li ber wê rûdanê bigre, belkî ez nizanim, bi tenê dimîne pirsek..!
Û piştî vê bûyerê bi sedê hezaran bûne qurban,li Efganistan, Îraq, û niha li herêma rojhilat bicarekê, û bi melyonan koçberbûn û niha tu jî belkî nemreyekî ji wan.
Pirsên te bi dawî nabin lê carcaran dema ku tu diterpile, an li ser wan şiyatokan dişemite tu bi xwe hest dibe ku hîna ew kesê ku li kêleka te dimeşe pinpinê dike û di ber xwe de daxive, na yabo bi Xwedê îşev jî em ê bên girtin, ma tu nabînî çawa dimeşin û Alano me di ku re dibe, ew cara pêşî bû ku min navê wî rêzanî nas kir ku Alan e, û ew Kurd e, û ez nizanim ew ji derdora Amûdê, an Hisiça ye, ji ber ew cara didiwan bû ku ewê li tenişt min pê re hatiye..û bi rastî pitpita wî te bêhêvî dike û wê gumanê li cem te peyda dike ku îşev hûnê bêne girtin û sînorê Bulgaristanê derbas nakin.
Şev zîz e, tu deng dernakeve ji bilî xişxişa gavên wan koçberan di nav wê daristanê de, û fingfinga pêşî û kelmêşan yên ku bi derbasbûna wan koçberan kêfxweş in. Her koçberek rû û destê wî ji pêvedana wan kelmêşan werimîne û ji xwerandinê xwîn di şûna gezên wan re tavêje, tevî ku hinekan derman û hetwan jî bi xwe anîne, lê nikarin êrîşê wan vegerînin, ma her car derfetek wilo ji wan re nayê ku şûna xwe li ser dest û riwê wan bihêlin.
Berê sibehê ye,xew gelekî xweşe di vî çaxî de,tu xweziya xwe bi germa livînekê tîne di nav zarokên xwe de,lê qolincên tirs û tariyê çavên te beravêtî dikin,gavên te hilm û hêwîbûna tariyê hildimisînin.
Lê ji nişkve pasgehek te hildiçenîne, ev pasgeha leşkera ye, lê gelo ew di nav vê daristanê de çi dike?.
Berî ku pirs te matmayî bikin, dengê gulleyan qîr û hawarê bi koçberan dixe û wan radestî leşkerên Bulgar dike, bi wê tirsê her yek di cih de dimelise û helkehelka tirsê rê nade pêlên ba da ku sînga wan daweşîne û xwînê bi aramî di rehên laşan re biherkîne.
Bi wî zimanê xwe bi ser we de diqîrin, lê hûn nizanin çi ji we re dibêjin, heger xeber û dijûnan jî bikin win tênagihêjin, nexem e….loooo.
Lê ew tiracîdiya di wê qûnaxê de û di wê derengiya şevê de, dikarîbû xelekên wan bûyerên berê di sebeta serê te de vegerînin.
Rojên ku li bajarê te rû didan bi vî şêweyî ji gullebarandinê û laşê şevê dibû nîşanek ji gulleyan re, weke ku xwê bikeve agir de wilo hemî cûreyên çekan bi kar dihatin û bajar xwe di hundirê xwe de dipirnisand, lê te tu bersiv ji pirsên xwe re ne didîtin, gelo çima di dawiya şevê de ev bûyer çêdibin, qey berê sibehê û ev bûyer bêyî hev nikarin bijin.

ÇAND (3-3)

Shahînê Bekirê Soreklî

Da ku Kud bikaribin rê li berdewamiya wendabûna çanda xwe bibirrin, danîn û bicîhkirina bernameyên rêk-û-pêk pêwîst in. Mixabin ji bo danîn, birêxistin û bicîhkirina bernameyên rêkûpêk rêxistinên Kurmancan ne amade ne, ne jî xwediyên derfet û kadirên pêwîst in. Di rewşa îroj de tenê çirûskeke hêviyê li başûrê Kurdistanê xuya dike. Em hêvî bikin ku berpirsên li wir ne tenê grîngiyê bidin çandê, lê parastina tevahiya çanda Kurdan bo xwe bikin amanc.
Di nav 20-30 salên par de hinek kesan, koman û çend rêxistinên Kurmancan li gor xwe û derfet û pêkaniyên xwe gavine derbarê parastin û pêşvexistina Çandê de avêtin, lê ji bo neteweyeke weha mezin ranana wan gavan têrê nekiriye û têrê nake. Di nav Kurdan de cîhgirtina şoreşeke hişyarkirina çandî divêt, lê ji ber ku Kurdistanê bi pirranî dewlet niye cîhgirtina şoreşeke weha ne hêsan e. Wek yekemîn gava vê şoreşê berfirehkirina proseya xwendinê di nav Kurdan de divêt. Mebest bi vê yekê ne ew e ku tenê di nav "rewşenbîrên" Kurdan de xwendin û nivîsandina bi zimnaê kurdî zêde bibe lê ew e ku xwendin û nivîsandina bi kurdî têkeve nav milyonan ji endamên vê neteweyê. Lê gelo cîhgirtina proseyeke weha di nav Kurmancên îroj de ta çi radeyê realîst e? Em êdî hemî dizanin ku zimanê kurdî yek ji mercên herî grîng yên hebûna neteweya kurdî ye. Em her weha dizanin ku bi derbasbûna demê re li hinek beşên Kurdistanê, bi taybetî li bakur û rojhilat (Kurdistana Îranê), Kurd bi hejmarên bilind zimanê xwe ji bîr dikine û dest bi axaftina zimanên din dikine. Her weha aşkere ye ku hejmareke bilind ji Kurdan bi kurdiyeke şkestî diaxifin. Me hay ji alfabêyên cuda û zaravayên bi rêzimanên cuda heye. Televizyonên satelîtî yên kurdî û bernameyên radyo heye ku di van demên dawîn de ta radeyekê roleke erênî derbarê ziman û Çandê de di nav xelkê de leyiztibin, lê di heman demê de televizyon û radyoyên bi zimanên tirkî, erebî û farisî bandoreke mezin li ser Kurdan hene. Ya rast keyfa gellek Kurdan, hinekên li derve jî di nav de, ji temaşekirina li bernameyên bi zimanê kurdî bêhtir ji temaşekirina yên bi tirkî, erebî û farisî dihêt. Sedema 1em ew e ku ew ji kurdî bêhtir bi zimanê din dizanin û sedema 2yem ew e ku bernameyên televizyon û radyoyên kurdî yekton û yeskşêwe ne, ne rengîn û pirralî ne.
Rojên îroj malperên kurdî jî xwediyên leyiztina rolên grîng in, sebaret bi ziman û çanda kurdî. Hinek karên bash hatine/dihên kirine, lê ew rola mezin ku gellekan ji me ji înternêtê û malperan hêvî dikr, mixabin hîn bi shêweya wekî pêwîst dihêt dîtin nehatine leyiztin.
Ger di nav Kurdan de daxwaz û derfetên parastina Çanda kurdî û dewlemendkirina vê Çandê hebin, wek li jor diyar bû gava yekem bi berferehkirina proseya xwendina bi zimanê kurdî dest pê dike. Ji bo vê yekê ber her tiştî pirtûk divên, pirtûkên fêrkirina zimanê kurdî û nivîsandina bi vî zimanî. Bi milyonan pirtûkên bi taybetî ji bo zarokan hatinî nivîsandin divên, bi milyonan ji pirtûkên bo ciwanan hatinî nivîsandin divên. Xwendin bi zarokan û ciwanan dest pê dike. Di heman demê amadekirina proseyeke pêdagojî divêt, proseyeke ku li gor wê bi hezaran kes bihên perwerdekirin, da ku têkevin nav tax û şeqamên bajaran, biçin gundan û xwe bigihînin dayan, bavan, xûşkan, brayan û wan fêrî xwendinê û bikarhanîna pirtûkên ji bo zarokan hatinî nivîsandin bikin. Pirtûk û bernameyên pêdagojî divêt ji siyasetê û propagandaya siyasî vala bin. Van pirtûkan pêwîst e ji aliyê pisporan ve, ji aliyê kesên ku peywendiya wan bi zimên û şert û mercên pêdagojî re heye, kesên ku derbarê qonaxên fêrbûnê li nik mirovan û mentalîteya nifşan de agahdar in, hatibin nivîsandin; bi zimanekî hêsan, bi wêne, bi locîk. Li her dera ku fêrkirina ziman û xwendina kurdî mumkin be, birêxistina kûrsan divêt. Mîdyaya kurdî ya dengî û wêneyî divêt xwe bi salan têkele vê proseyê bike… Eger dewlet dijwarî û astengan bi rê xin, amadebûneke rêkûpêk divêt da ku rêxistinên navneteweyî û yên mafên mirovan bihên hawarê… Careke din dubare bikim ku gellekî grîng e proseya fêrkirina zimên ji propaganda û hêvotina siyasî vala bimîne.
Ji bo birêxistina proseyeke weha bêhûde derfet û amadekirina bi program û tevdêr divên, dezgeh û dayîre divên, û ber her tiştî pere divên. Amadekirin û birêxistina proseyeke wek ya li jor ê bi salan biajo. Gelo Kurdan van derfet û pêkaniyan, kadirên pêwîst û pisporên derbarê amadekirina matiryalê pêwîst de hebin? Ger nebin, wê demê li vir û wir gavine ê bihên ranan, li vir û dera han proje ê bihên birêxistin, lê bidestxistina encameke bi hêviyeke mezin ê ne pêkan be. Ji lewre amadekirina kadiran, mamostayên têgihîşt û pisporan divêt!
Ji bo parastina Çanda kurdî ji wendabûnê, ji bo lêgerîn û lêkolîna derbarê beşên wenda bûnî de, û ji bo zindîhîştin û pêşvexistina Çandê bêguman kiryar û ranana gavên din jî pêwîst in. Ji bo wan jî tevdêr û plan û dezgeh û kadir divên.
Mebest bi nivîsandina vê gotarê ne raberkirina wêneyeke reş e, lê ew e ku bi kêmasî yê / ya vê gotarê dixwêne rewşê bi şêweyeke realîst û rasteqîne bide ber çav û hest bike ku ji bo parastina Çanda kurdî û pêşvexistina wê xebat û tevdêrên bêhûde divên, xebat û tevdêrên ku her endamekî / endameke neteweya kurdî bi xwe ve girê bide.

Tevn û Teşî Di Filiklorê Kurdî De

Maşallah Milazgirtî

Bermal: Cureyak berra nexşandî ye û diavijin ser nivînan.
Tevn: Dezgehê veçirandinê ye.
Hevo: Benê ku di tevnê de berwarkî tê avêtin.
Firêd: Ji benê duttayî re tê gotin.
Rino: Şeyê tevnê ku ji dar hatiye çêkirin.
Kerkît: Ew amûrê ku di dema veçirandinê de ji bo ku ta nêzîkê hev dikin. Ji hesin hatiye çêkirin.
Befş: Textikê ku bi masûr di navbera tayên tevnê re derbas dibe û tayikan ji hev vedike.
Masûr: Ji mekîka tevnê re tê gotin.
Hepik: Amûrê ku di dema veçirandinê de ji bo ku tayikan nêzê hev dike.
Şeyê Hiriyê: Amûrê ku ji bo hirî were ristin pêşî hirî pê tê şekirên.
Teşî: Amûra ku pê rîs tê ristên û dibe benik.
Hirî: Ji pirça mihan re tê gotin.
Liba: Yan jî liva. Ji pirça berxikan re tê gotin.
Çewal: Jê re cem/cemik jî têne gotin. Ji tayê hiriyê çê dibe, li ser tevnê tê veçinandin, pişt re çewal çê dibin.
Têr: Mîna çewalan tê veçirandin, du cemik bi hev ve têne dirûn, diavêjin ser pişta ker, hesp û hêstiran, xelk alavên xwe pê dibin û tînin.
Xwircik: Jê re heqîb jî tê gotin. Ew jî mîna têr, çewal û cenikan bi tevnê tê çikirin û weke têrê biçûktir bûn, ji malê xalîça bû û diavîtên terkiya hespan.
Gorê Rîs: Serê pêşî rîs (hirî) dihate ristên, pişt re jê gore dihatên çêkirin. Rîs çiqas zirav bihata ristên ew qas gore jî xweşik û nazik / çavhebîn çêdibûn.
Kap: Jê re qetik jî tê gotin. Ji benê rîs dihate çêkirin. Penc û şeş ben dihatin hûnandin û dixistin stûyê golikan.
Kulav: Kulav ji libaya berxan dihate çikirin. Ji pisporên kulavan re digotin "Libajen".
Libajenan libaya xwe bi awayekî xweşik dijenandin, pişt re li erdê cilekê rast dikin, libaya ku jenandine li serê radixêlin, darekî dirêj dixin navê û li hev dipêçin, pişt re bi şerîtekê hişk girêdidan û kulavê pêçayî digindirînin. Ji vî karî re dibêjin: Borandin. Çend zilam piyê xwe bi hev re lê dixin, av lê direşandin heta ku ew liba hev digirt, pişt re derdixistin û dibû kulav.
Roja ku kulav li malekê bihata lêxistin, mirov digot qey li wê malê govend heye. Ew roj xwarin dihate çêkirin, danûkên genim dihatên pijandin û li ser denûkan mewîj, kakilê guzan, û kakilê bindeqan dihatin xwarin. Ciwanan hinekan li kulav didan, hinekan jî leyistik dileyistin. Gava ku ew diwestiyan cihê xwe bi hevdu vediguherandin. Govend dihate girtin, kilam dihatin gotin. Bi vî teherî kulav dihatin çêkirin.

Xalîçe: Di serî de hirî dihate ristin û dibû rîs, ew rîs badidan dikirin "firêd" yanî duta dikirin, pişt re reng dikirin û dixistin telaş.Tevn dihatine danîn û bi vî tehrî dihatine veçirandin.
Nîşe: Di vê lêkolînê de ji ber ku alikariya min kiriye; ji Seydayê rêzdar Mele 'Elî Balqaya re spasiyên xwe pêşkeş dikim û ez dibêjim Seydayê rêzdar sed hezar car mala te ava.

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestin Bijartî " Dildarê Aştî"

Bang

bang
hey revokên ber bi xopaniyê de
werin vegerin li min
tenê karim
hêviyên we yên sitewr
bi gon bidim ..

Rawe

hêvî
bi devê penceran ve serjê dibin
saw û sawîrên dirînde
birînên min dixepêrin
veşargehan
di xavika zayînên min de vedidin
û gûmanên çavsorî har pîkoliyê
di guhên min de dikin..!!

Qêrîn

Di Bîst û Pêncê heyva Cotmehê de sala 1966an de li gundê "Navkurê" yê bi bajarê Qamişlo ve girêdayî ye hatiye dinyê. Lê di doseyên fermî de jidayikbûna wî di sala 1969an de hatiye qeydkirin.

/1/
qîran bide
ta ku tu dawerivî
lê çi hêjane ev qîr..?
ku dengê te
guhên te nebûrîne..!!

/2/
eger ku qêrîna te
çeperan neçirîne
sînoran neherifîne
perwaneyan
li delavên sorgulan necivîne ..?
bi hêminî
çavdêrî sawan bimîne
çêtir e..!!

Doza

Serma ye dijwar e doza
Bahoz e...ba...
û pê re pîjên kînê
tiştek me nanixumînê...
ne ti al ..
ne ti bext...!!
şewitîne koz û belgeyên daran
pîrepindan tevnên xwe nehûnane
û kevokan hêlînên xwe berdane
şikeft mane bisaw û bê dergevan
li giyanê peyxamberan kulibîne
nijdevan
êdî were .....
hey omîda evî dilê perîşan
were em hev himbêz bikin
bi agirê evînê xwe germ bikin
amadeyî berberiyê
berxwedanê nû
bikin em dîlberê..
1989.z

Lavelav

ne pêwist e ev lavelav
bawer bike
kevokekê dilê min revandiye
ber bi bêhna çiya de
û dengê azad
ber bi şopa Siyamend û Ferhadan de
û çemên dil

şad
niha.....
de rabe tu
hey keça arezûmend
tu jî dil jê re birêke diyarî
belkî mîna du feriştan payedar
belkî di henteşa wê de
bicivin her du giyan...
1990.z

Ez ê Bêm

kulîlka min....
hengeyek perwerî tî me
ji rivînê
ber bi baxên xewna te de revyayî me
digel sêncên direhî
ez ê bêm
hinguv ji nav lêvên te
binisilînim
ez ê bêm û mizgînan
di fîxana bêzaran de vêxînim
da rondikên şadîmanan
van giyanên azirandî
raşoyînin....
1990.z

Rêwî Me

Rêwî me...
û pêwist e bûrandin
li seranserî sînoran
saw qozikên xwe disûn baskokirî....
Birîndar e kevoka min
li ber bayê
reyandina dezgehên ragihandinê
bawî dibe helbesta min
êdî çawa?
saloxên pertikandina çivîkan
saz û ritmên raperîna çemên xwînê
çawa biryara evînê
bighînim destê yar!?.
1989.z

Xewngîrî

bi nav xeman de dûr çûye
peravên hêviyê dûr in

Li dibistanên Qamişlo xwendiye û bawernameya duwayî ya giştî\beşê zanyarî da sala 1986an de wergirtiye.

deryavanan
qeyikên xwe bûrandine
bi tenha
şikestiye helbesta wî
li keviya dudiliyê
keseran ew hilanîne bi pêlan
pirs û gûman
guhên wî dikişkişînin
li ber çavan aso dişkin
diruşim reş girêdayî têne xwar
çavan digre
bi hatina pêleke tewş xewngîr dibe...!!

1989.z

Dîsa Va Me

erê...
dîsa va me
li ber deryê malbava te
di canê min de mestbûnek dinale
areziwek dikale
va dilê min mendalekî şevdere
kolan kolan digere
himbêza te
penageheke ewle ye de were...
1991.z

Vê Carê!

Li bajarê Qamişlo dijî û ji qurbaniyên serjimêriya 1962an e

vê carê...
ku hatim civanê te
berî ku em
dibin perên birînan de binav bibin
berî ku em
di gerînoka pirsan de winda bibin
min agadar bike bo maçê..!!

1988.z

Şewitandin

ne tu dikî
ji zindana payebûnê rizgar bibî
ne ez wêrim
sawên evan sînoran bibûrînim
ez li vir û ...
tu li wir...
bibêhrî dişewitin
dibin arî
bê ku geş bikin ti warî..
1990.z

Ne Bêje

ne bêje min:
-"piştî şikistina tînê
şemala hatina te wê vemire".
dîlberê na
ne bablîsokek bi hewes bêm û herim
sirek ba yê pelendarî perwerim
di derbend û
hemî asêgehan re ez dibûrim
alên evînê eşkere
di esmanên mêbûnê de hildigrim.

1989.z

Rêwiyo

rêwiyo...
di kelkela vê lavê de
bêhnefişka xwe ragire
çiye ev lez û beza te..??
li xwe bizîvire carek rê bi sawe
rêwiyooo....!!!
eva ku tu li pey digrî
rewrewk e...
ne mizgîna şadiyê ye
eva tu ber pê de dimrî
leylan e
ne çemê azadiyê ye...!!
1992.z
Sernixûmkirina Helbestvanekî
soz ji bo te mîrê min
vê carê
canê min ne qurmiçîne
lê carek din
hew guhê te bi vê sazê diwestînim
hew xwestekên belengazan dixwînim
ez ê van kaniyên xewnan biçikînim
termên helbest û ramanan bi esîdê
bisotînim
bes vê carê
canê min ne qurmiçî ne...!!!
soz ji bo te mîrê min.....!!!

Naxwe

wekî wisayî ezbenî
li gorî dilbijokiyê dibûrî
dihênijî...
dilekijî....
dikujî.....
naxwe ji mafê min e jî
ku xewnên xwe
di guldanekê de
li ber serê xwe vêxînim
û çivîkên ramanê
di firewaniya helbestê de
bifirînim..

Dema...

dema tawankar tên û
bi şûrên xwe çep û rast gerdenan dixilînin
gulîstanên aştiyê
xewnên xwe diweşînin
şax û kulîlk tawî dibin
perwane bawî dibin
û peyv
dibin mêşikin gurî
di demûşa diruşman de diçikilin...!!

Helbijartin

ji şêwazê kargêriyê
kerên kor diengirîn.
piştî guft û goyekê
ji bo serokatiyê

Ji destpêkê de helbest bi zimanê Kurdî û helbesta kêşesaz nivîsand, di nîvê salên Heyştêyî de ji serdema bûrî de dest bi helbesta nûjen kir, yek dîwanên wî çapkirî bi navê " Were Vê Êşa Bilind " heye.

mirovek helbijartin...!!
rojin bûrîn.....
û cendekên pirsan
di xwînê de gevizîn
careke din raperiyan
lê vê carê
kûçikek helbijartin..!!

Delûdînê

delûdînê....
çi xewnin te dixapînin..?
çima wisa ...?
di pencera payebûnê re dîq dikî..
û lêvên xwe dirêj dikî.
tû nizanî...?
ev bajarê tozê ye
û çavên bikenîşt
bajarê demûşê ye
û mêşikên mirarokî..!!
li ber
dergehê kirêtiyê
nêrên xesandî
û mêyên pûşt
ciwaniyê bazar dikin...!!

Bêsûde

roj bêpêjin
temen dimeridînin
û demsal
dûvê xwe li hev dipêçin
ez im
yê li ser tehtoşka demê dinive
bê ku pirsek bilive canê wî diwerive...

Sofiyo

sofiyo....
berê çû bi berê re dikudîne
devê xwe

ji nav axê derîne
tu nikarî gera demê rawestîne...!!
eger tu arezûmendî
rabirdûyek bi ronî damezirînî
derbarî pirsa rojevê
tê rola xwe bikêr bînî
wê pêşeroj
li ser anya dîrokê serfiraz te bijînî...!!

Xalo

xalo.....
tu bi pendên sinceyî
giyanê min dîl dikî
û zerya te di pişt çît re
di pala peyvên te re
awiran dadihêje min
ber bi windagehên xwe de min dibe....
lewra
sîberê min li ser kursî
li ber te tarûmar dibe...!!

kebaniyê

kebaniyê...
sibehên te xeyidîne
rojên te
di kef û aravan de xwe noq dikin
tiliyên te bûne "darik"
bi têla cilan ve mane..

kebaniyê...
qeretûn û taştê
firavîn û şîv...
û şev tê qure û gîv..
rondik mîna gulsitêran têne xwar
li ber dergûşa xemê dihênije bejna
nazdar
dilekije li xewna te xirxira mêrê
zordar...

û herî tu dinisilî...
bê sirûdek
bê mizgînek
wisa ev temenê ciwan
xula xwe dibûrîne
bêgulvedan...!!?

Dostek

bi geşbînî derbas dibû
bi ken û şelafiyan çayê vexwar
sozek birî
û çirvirand
civan danî
û çû mîna marmarokê xwe veşart
ez dimam.....
ta sawîrên celdeyê
bi ser min de xiliyan
gêrikên bendewariyê
di laşê min de westiyan
ta pencrên derdoran baweşkiyan...
û nehat...!?

şam-1992

Alek

aleke...
bi dîwarê oda min ve
hîna helawistiye
li binya wê
wêneyê mendalekî felestînî xwe dadide keviran...

roj dibûrin...
û demsalên kerepûlê
lehengan pêşkêş dikin
hîna jî lewendiya xwe parastiye
dûrî gemara mêşan
û lotikên li derbarî vê odê
hîna di pencera dil de bi azdî pêlpêl dibe
di gel pêvedana pirsan

Xelata baştirîn helbesta nûjen du salan li du hev di festival helbesta kurdî de wergirt, destnivîsên wî li ber çapê hene

û finasên pêxwasan
ber bi başûrê min de
û başûr
di qûntara xerdelê de
bêhnefişka mendalan
dihêwirand..!!
1992.z

Weke Ku Ez...

weke ku ez şûrek im di xavika rojê de
weke ku ez derya şêtim di bejê de
weke ku ez firtone me di dojê de
wisa.....
pîlebazên vê deverê
ji hatina min ditirsin
dergehên xwe asê dikin
zarokên xwe
bi efsanên jiyana min dixin
xew de
û hîna ez
şikestinên xwe dijmêrim...!!
1996

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545

bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Peyva wendayî

Peyva wendayî ji 5 tîpan e, meheke salê ye.

Ji nav gula derket meş tê, wek horiya nav buhiştê, gulan hilm û bîna xweş tê.

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	B	U	H	I	Ş	T	Ê	N
2	D	H	O	R	I	Y	A	A
3	E	A	W	H	T	Ê	V	V
4	R	A	E	I	M	E	Ş	Û
5	K	N	K	L	T	Ê	Ş	D
6	E	Î	A	M	J	I	E	N
7	T	B	G	U	L	A	W	A
8	G	U	L	A	N	R	X	V

Bersiva peyva wendayî hajmara39an: Malbatî

Xaçerêz

	1	2	3	4	5	6	7	8
1								
2								■
3			■					■
4		■					■	
5				■		■		
6								■
7					■			
8			■					

Asoyî:

1- Taxeke Kurdan li Helebê.

2- Azadî.

3- Bo nîşandana nêzîk, ev şev.

4- Gelekî kevin e (vajî).

-٥ Çêjeke xwarinê, ji agir derdikeve (vajî).

6- Roja betaliyê (vajî).

7- Weke.

8- Jimarek e, movika nêv dest û mil (vajî).

Sitûnî:

1- Zimanzanekî Kurd e.

2- Ji darê ye, bê aqilo (vajî).

3- Rez (bê dengdêr), welatekî Rojhilatê.

4- Leheng, mêrê temen mezin (vajî).

5- Ji rêbazeke şoven e.

6- Baxek li Cizîra Botan, Ev (yekjimara nêr tewandî).

7- Di nav tîpên (Heyvî) de bibîne, tersî hebû (vajî).

8- Amûreke mûzîkê, paşdaçek.

Xaçerêz Bersiva hejmara 39an

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	Z	E	V	E	N	G	Î	■
2	O	R	Î	B	■	N	Î	Ç
3	R	■	N	O	T	E	■	E
4	A	D	■	S	O	R	A	N
5	V	I	R	■	Z	■	A	G
6	A	R	Î	N	■	B	A	Z
7	■	A	■	Y	A	R	■	Ê
8	E	N	D	E	Z	Y	A	R

Mamik

Wekî pirpel e
Nivîs lê bel e
Bi bend û bal e
Ji te re heval e!
* **
Lastikek nerm e
Radike çivê qelem e
***
,,Ne bi hest û gêjî
Bi pîvan û mêjî
Qelema radihêjî
Ji bo rast be dirêjî
***

Bersiva mamikan hejmara 39an
(Ling – çav – pênûs)